FERHAD IÇMO

QÊRÎNA YEKEMÎN

HELBESTÊN MOBAYIL

DIYARÎ : Ji bo her kesê ku peyvekê li ferhenga zimanê kurdî zêdebike.

Qamişlo

12 – 09 - 05

ÇIMA HELBESTA MOBAYÎL ?

Ji ber ku pirbûna peyvan bi pera tê pîvan bi kurtayî tê danîn .

Sînor , têlên bi dirî û rêsayî û dîwarên bi saw û bilind li pêşiya wê winda dibin.
Bi girtin û vekirina çav re , xwe dighîne war û qûnaxên li paşiya deryayên ne nas .
Çavdêr û zêrevanên bê hest li hemberî wê neçar di mînin .
Heger çê û hêja be , bi mobayîlan mîna penceşêreke dijwar belav dibe .
Ta ku rindik be pêwîste ku hindik be .

Bi bûrin ...

Heger ez negihabim nêzîka sînorên mebestê , min bavêjin ser pişta darbestê û xwe berdin nav baxên helbestê , lê jibîr nekin min li derî daye û razîbûna we vebûna derîye .

Hêvîdar û lavekarim ku ev derî û gelek deryên dîtir di pêşerojê de bi destên helbestvanên zîrek û zane firehtir vebin .

Ferhad IÇMO

www.tirej.net/com

CIVÎNEK NETEWÎ

Ji ber tirsa zindana ,
û yaseyên awarte
Ferat , Xabûr , Ceqceq
Dicle , Hêzil , û Zab
dûrî welat
eşkere dighên hevdû
ji bo rondikên Aras
civînek netewî
berî windabûnê
li dar dixin

10 – 11 – 03

WERZÊN EVÎNÊ

Min tu naskir

dema ku ewrekî rêbar
di singa ezman de digiriya ...
min bêriya te kir
çaxa ku bilbilekî evîndar
di nav
Nêrgiz û Nesrînan de difirya...
min ji bêrîkirinê hewarkir
gava ku gundiyekî xewar
bi ser kaya bênderê de dibûriya...
min pêjna te kir
piştî ku zîzbûneke sar
di hêlîna
hechecîkê de dizûriya...

12 – 11 – 03

EVÎN

Tenê .... evîn ...
kare bihêle
ku evîndarên rêwî
li hev dû vegerin
û ...
ewrên kînê
ji ezmanê perweriyê
barkin

04 – 2 – 03

DIL

Li welatê evînê

dilê te
ûtêlek bê sitêre
û li ser ...
çiyayê Cûdî
dilê min
xanîkî biçûke
pirtikên berfê dijmêre ...

16 – 2 – 03

KALKÊ MIN

Kalkê min

digot :
ji evînê pîstir tine .. !!
lê ... piştî ...
min evîn baş naskir
ez li ser

temenê kalkê xwe
giriyam ...

30 – 8 - 03

LEL

Heger te bivê

Perwan û Heng û Bilbil
mêvanên pencereya te bin
gula biçîn ... !
heger te bivê
hewar û qîr û nalîn
dûrî dîlana xewnên te bin
kulla biçin ... !
heger te bivê ... !1
sal û mehên
malzaroka pêşerojê
guhdarê dengê te bin
lella bişkîn .. !

29 – 9 – 03

JIYAN

Dema
jiyan pişta xwe
dide mirov
serhildana kul û êşa .
kefenê xwe
diçirrîne
û kêlên xwe
dişkîne .

2 – 10 – 03

DERGEHÊ AZADIYÊ

Piştî ku şûna destê min

di dergehê azadiyê de
hate kolan
yekitiyê pencera xwe vekir
û ... got :
mane ji mêje ve
min ji bo te gotiye :
pêşî li deryê min de

28 – 10 – 03

ŞERÊ DÎKA

Bi berbangê re ...
keleşêrên cîhanê
tevde dixulxulînin ...
lê ..
kelekok û kelebayên me
ji şerê hev diwestin
bi ser birînên xwe de .
di xwe de
dinihirînin...!?

29 – 10 – 03

DIRÎ XAÇ

Têlên bi dirî

sînorên ...
welatên cîhanê ,
diparêsin ...

lê ...
xwe kirine xaçek ... !
û dilê min ,
kirine çar perçe ... !!

31 – 10 - 03

KIRASÊ RENGÎN

Min .... nizanîbû ...
ku ez bihara rengan ,
ji dor bejna te ...
birevînim ...
wê qêrîn
bi payîzek şermezar keve

8 – 11 – 01

ŞÛR

Heger ....
tu cihê xwe
li nik min
nasnake ...
rahêj şûrê xwe
û sînga min
biçirrîne ...

10 – 8 – 02

QASID

Piştî ku qasidên
min û te
bextê xwe
firotin ...

min bawerî
bi dilovaniya
telefûna anî

15 – 8 – 02

... !? EVE

Di gurbûna

şerrê ...
kurd kujiyê de .
sawa dijmin
ji dilê kurda
derdikeve ... !!

3 – 9 – 02

SÎK

Sibehê ...
li dirêjbûna
siya xwe
ma matmayî .
nîro ...
siya wî
li bejna wî
bû ...
marekî badayî .

6 – 9 – 02

SIPAS

Sipas ji bo :
yezdanê dilovan .
me bawer nedikir
ku kurdistanek me

çêbibe ...
va em bûn ,
xwedî ...
çend melyon
kurdistan ... !!

31 – 8 – 02

ERÊ BIRA

Ne bi destê xwe

em hatin
jiyaneke pûç .
razîbûb ...
di navbera
me û wê de
bûye wek evîna
ar û ardû.
ji ber bersivên çima
em bûne perîk
li ber bayê
qederê ...

11 – 8 – 02

HELBEST

Helbeste melbeste

çi dîlanek bê weste
di hembêzê dil meste
bi daxwaz û mebeste
hin ramane hin heste
bi wêne û helweste
xeyal têde serbeste
tirs ji ber wê bindeste
bê awaz be darbeste
guh ji xweşyê na weste

1 – 8 – 02

KURD KUJÎ

Bi qupîna tivinga yekemîn re

pîrekan lîland .
û min qîrkir :
gundîno rabin serhildane ... !
pişti ku me ...
diyarê li pêşiya mala derbaskir ,
em li çi binerin ... !
di navbera du êlan de ,
şer û kujtin û talane ... !

27 – 10 – 01

XUNAVA DÊMA

Dema rok

li paşiya perçên ewra
ketibû zerkê de
û xatir dixwest ...
lêvên ..
xecxecoka rûqurmizî
di qurmê dareke jêkirî de
vedibûn bi hêviya
jîneke serbest ...
tîrêjên
ronahiyeke rengîn
ji xalên xunava dêma
direviyan ,
mîna tilîkên dest ...!!

13 – 12 – 1999

NIZANIM ÇIMA...!?

Nizanim çima

min bi şaşitî
li deryê jînê xist ... ?

bê dilê xwe
jînê derî vekir
pişta xwe da min
û ...
ji min re got :
ey nêçîrvanê ,
axîn û nalîn û qêrîna
ferno rûnê
li ser masa
kul û êş û birîna ... !!

15 – 10 – 03

DEYINBAR

Min ...
ew fêrî her tiştî kir
lê ...
piştî ku wê
ez fêrî evînê kirim
ez bûm
deyinbarê wê...

2 – 2 – 04

NEYNIK

Heger rokê ji roja

min ... gazin
ji yek neynikê jî kir
wê çaxê bêjin :
tu gazinokiye...

1 – 9 – 04

GORISTAN

Piştî ...
zerbûna dara jînê .
li ser ...
pişta darbestê .
li ber deryê goristanê
ez ... û .. kerwanê hêviya ...
pêrgî hev û dû bûn...

10 – 9 – 04

QAMIŞLO

Di nav ...
kavilên adarê de
li kêleka goleke sor
rondikên xweziya
bi ser lingên
Hirmiz de
dibarandin ... !

20 – 3 – 04

KURIM

Li daristana jînê

min tu dar
bê kurm nedîtin
ji bilî ...
dara evînê ...

10 – 11 – 04

AL

Xwîna min

û qêrînên rokê
û merşên biharê
bêriya ...
rûpelê berfê dikin...

10 – 11 – 04

KOLAN

Di kolanên dilê min de

li hêviya berbanga evînê

rêbarekî bê zar
her êvar dihêwire ...
li dor pêtên wî
sînga min gulav dide
û laşê min disincire ...
nizanim çawa
rekeha sînga min diçirrîne ,
û peyala xwe
ji nalînên min dadigire ...

10 – 11 – 04

PIRTÛKÊN BERFÊ

Bi barîna wê re

tev de
darbestên xwe dişkînin
û gazî dikin :
werin heyvanê helbesta
werin mizgefta mebesta
werin neyarê bê hesta.

11 – 11 – 04

LEHÎ

Lehiyên demê

her tişt kirin lêmişt
û li ber xwe birin ...
lê ...
yek tayek
ji kulîlkên evîna te
ji baxê dilê min
ranekirin ...

12 – 11 – 04

DÎLBER

Berî te ...
min derew li wa dikir
û wa ...
ji min bawer dikir ...
piştî te ...
min rastî
li ber wa radixist
lê kesî ji min re
dergehê guhê xwe
venedikir ... !!

13 – 11 – 04

ŞEV

Deryayên çavên te

sûlavên porê te
cobarên hêsrên te
û goristanên xewnên te
hiştin ...
ku ez bibim
evîndarê kirasê şevê .

14 – 11 – 04

ZENGIL

Her şev

piştî ku mûma min
rewanê xwe
disipêre pencên taristanê
zengilên evîna te
di perestgeha dilê min de
dîlaneke nû
di gerînin...

29 – 12 – 04

SED DIL

Heger .... xwedê

sed dilî bide min
bê dûdilî ...
ez ê her sedî
bikim diyar
ji bo te !?

9 – 12 – 05

PIZIK

Ji bêrîkirinê

li hêviya ramûsanên te
pizikan ...
konên xwe ...
li ser lêvên min
vegirtin .. !?

10 – 1 – 05

NIVÎN

Nivîna min ....
bûye ezmûngeha
xewnên çikyayî ...
û firîngeha
rewanekî westyayî ...
û firoşgeha
fermêzkên revyayî ...

20 – 1 – 05

ALA SIPÎ

Hin caran

tê xwestin
ku mirov
bi mêranî
Ala sipî hilde...!!??

24 – 1 – 05

PEYMANA EVÎNÊ

Pişti ramûsana yekemîn

tûpişkên katjimêrê
li hev û dû aliyan...
sûlavên
rondikên mûma evînbar
bi ser gulistana baskên
perwanê de bariyan ...
tenê sitêrên rêwî
li ser peymana evînê
û termê
herdû evîndara giriyan ...

19 – 2 – 05

JIN

Dûrî wê

jiyan dûjehe ...
û bi wê re
zindanek firehe ...

31 – 2 - 04

TENÛR

Siya bejna

xweziyên dev dirûtî dirêje .
roka xeydok
çîrokan ji aso re dibêje .
ezmanê sayî
li hêviya sazên gelawêje.
û ...
tenûra himhimî
bendewarê şiyarbûna nan pêje .

7 – 9 - 05

HETA

Heta tiliyên destê me

li hevbin
têlên tembûra me
naqetin ...
heta têlên
tembûra me neqetin
wê dîlanên me
li darbin ...
heta dîlanên me
li darbin
sitranên me
winda nabin ...
heta sitranên me
windanebin
wê zimanê me
zendîbe ...

heta zimanê me
zendîbe
emê hebin ...
heta em hebin
divê tilyên destê me
li hevbin ....

14 – 10 – 099

LI ÇEBKA NAXIM

Li çebka naxim ...

li çebka naxim ...
ji bo êşek nû , li şûna girî
li çebka naxim ...
serê bawerya , himberî topa
tucar danaxim ...
veşartiyên dil , li sikakên rût
ez belav nakim
bazar hîn sare
xewn û hêvyên xwe
erzan ranaxim ...
heger ba neyê , ezê xwe kerrkim

ji bo kuştina , mêş û kelmêşa
şûr ji zik kalan
zû b’ zû dernaxim ...
payîz bihirî
çile zîvirî
li ser axa xwe , tev reh û şaxa
hîna bin axim

2 – 11 - 01

QÊRÎNA YEKEMÎN

Li ser dêmên

rûpelekî berfîn
du lêvên zuha
û çar diranên tirsonek
bi ser hevde
di rikrikîn...
bi qêrîna yekemîn re
dîwarên
zindana bîr anîna
tevde terikîn ...
bayên kul û êşa
perçên
ewrên omîd û hêviya
gihandin hev
pelkên zer û rizyayî
li dor
şaxên daxwaza
bi ser dêmên axê de
weşiyan
û zîzikîn ...
berî ku baran bibare
çemên
awaz û helbesta
ji bê dengiya
dilê min
ber bi derya xewna de
kişiyan
û ... herikîn ...

16 – 1 – 01

SITÊRÊN EVÎNÊ

Heger çiya

li ser sînga goga zemînê
bilivin ...
heger şîrmij
ji pêsîrên
sînga dayikên xwe
birevin ...
heger omîdên pîroz
bi melûlî
li ber dergehên yezdanan
binivin ...
heger volqanên dilovaniyê
di dilên guran de biteqin
û kurmên harbûnê
di nav
penc û diranên şêran de
rakevin ...
heger olperistên cîhanê
bi yekcarê
ji olên xwe
derkevin ...
heger xwîmij
û tawanbarên dev bi xwîn
li ber kavilên
dêr û mizgeft û nimêjgehan
li hêviya zirna Israfîl
bi civin ...
dibe ku wê çaxê
sitêrên evîna te
ji ezmanê baweriya min
dakevin ... !?

15 – 10 - 03

Naverok

Diyarî	3	Neynik	29
Çima helbest	5	Goristan	30
Civînek netewî	7	Qamişlo	31
Werzên evînê	8	Kurim	32

Evîn	9	Al	33
Dil	10	Kolan	34
Kalkê min	11	Pirtûkên berfê	35
Lel	12	Lehî	36
Jiyan	13	Dîlber	37
Dergehê azadî	14	Şev	38
Şerê dîka	15	Zengil	39
Dirê xaç	16	Sed dil	40
Kirasê rengîn	17	Pizik	41
Şûr	18	Nivîn	42
Qasid	19	Ala sip	43
Eve	20	Peymanaevînê	44
Sîk	21	Jîn	45
Sipas	22	Tenûr	46
Erê bira	23	Heta	47
Helbest	24	Li çebka	49
Kurd kujî	25	naxim	
Xunava dêma	26	Qêrîna	50
Nizanim çima	27	yekemîn	
Deyinbar	28	Sitêrên evînê	52

www.tirej.net/com